SERHATÎ JI FOLKLORÊ KURDÎ

Merwan Şêx Hesen

Dibêjin Mihê Şemdîn xortekî ciwan û sipehî bû, mêrxwas, jîr û celeng bû, baş bazerganekî bi nav û deng bû, ji kurdê êzdî bû ji eşîra Şerqiya bû. Rojekê li navbera, heval û hogirên xwe, xwe li kar amede kirin herine ticaretê û karwan bi rê ket. Li demekê gihan nêzîkî çemê Palwê û dîtin keçikek. Ya maşalah!... qey tu dibêjî periyeke asmaniye, hewa tab husin û cemale û ciwan sibehî wa belavê dike û cilan dişo li rexa çem. Mihê Şemdîn bi ciwaniya wê ecêb girtî ma û bi dîtina wê ra. Lê Mihê Şemdîn, keça hewa ya hêja digote hevalên xwe yên karwanî, "ez niha dikarim wesa bikim, ku ev keçik bi dû min bikeve." Hevalan digotê: "Ev tişt nîne, ne tu dinasî û ne tu dizanî ji çi dîniye û ji çi eşîretêye wê çawa bi rex tekeve?"

Mihê got; "başe guhên xwe bidine dengê min, çavên we li me be" Dibêjin karwanî, hemû rawistiyan. Mihê pêşberê wê sekinî û bendek stiran havête ser keçikê û demê benda stiranê wê kir, wê jî bendek havête ser Mihê û bendek ji wê û yek ji wî, heta yek û du hev nas kirin û hez hev kirin. Evîna Mihê Şemdînî jî kete dilê Xezala Mîrê Palwê û digote Mihê lazime tu min ji xwe re birevînî û bibî.

Mihê ji xwe ra digot: "Ya rebî zewaca min û xezala ya herame û bi kêr nayê û tu car nabe, pa ezê çi bikim?" Mihê di van gomanên kûr da û digot lazime ez xwe jê xelas bikem çawa be û digote Xezalê, "başe êvarî û piştî şîva, kar û barê xwe bike û serkeve ser qesra babê xwe û ezê li vê derê agirekî hilkim û ev agir jivana min û te be, hingê tê werê û ez jî çeplê te bigirim û birevînim." Gelek kêfa Xezalê hat û paşê Xezal hate malê û kete hizir û texmîniyan. Tarî kete erdê û Mihê jî hezar hizir û bîr kirin, wî wesa li bextê Xezalê kir. Demê tarî kete erdê Mihê li cihê jivanê kir û xezala serkete ser banê qesra babê xwe û demê çavê wê bi agir ket ji kêfa da dest havête bo xicka ra hela xwe û bi ber çemê Palwê ket. Demê Mihê zanî ku Xezala nêzîk bû deng li karwanê xwe kir û got: Bajon berê Xezal were eve we dê xwe min ba çî anî ku min jivan dayê û min agir hilkir lê ez nizanim û karwan bi rêket û çû.

Xezal jî berê ve wa hizir dike ku wî niha bigihe lawkê xwe û ji kêfa da tiranîbo çilo giheşte agirî hilkirî li cemê Palwê, demê giheşt çû kes li

wê derne wê tenê agirekî hilkirî û Xezal gelek aciz bû û boşmanî wê çendê bû demê Mihê Şemdîn bendên sitiranê digotin û ewî cewaba wî dayî û cawwa keça mîrî Palwî bi rex xwerekî bikeve li vê şeqê, aqil û sewda di serî da nema û li pê karwenekî keve. dibêjin Xezal mecbûr bû û berê xwe da mala dostekî babê xwe, dighe mala wan û digotin ez êdî ne dûrim herim mala û mesela min jî eve ye (serhatiya xwe û Mihê jî jê ra got) dostê babê wî ra bû qestek şande cem babê wê û jêre got: Demê babê Xezalê qesta keça xwe zanî, gelek haciz bû û gelek şerm kir û li ber xwe ket û nizanibû çi bike, digote qasidê: bêje filan kes (dostê wî) ew êca wesa kirî êdî li mala min veger mala min hera me heta ya saxe hema bila ew û li xwe mehir bike. Demê qasid ji wê û gotinê babê Xezalê hemî got û ji ber Xezal, hingê ya hêja û berketî bû ewî dostê babê wî Xezal li xwe mehir kir û bû ber maliya wî...

* Bi stran eve:

Bêje wey lê êêêê lê belê lê weylê weylê ê weylê weylê lê weylê

* Xezalê mîr me jê ezê duakê bikim, tu bêjî alah û amîne

dinya milkê xwe dê bibe,
dinya milkê reb alemîne
hege tuyê bi çembî ezê bi pirbim
Tuyê bi cîbî, ezê bi gorbim,
tuyê darbî ezê darbirbim,
tuyê seryek penêr koçerabî, li sûka ez im
Diyarbekira şewitî tîcareka mala zorî malzafbim
ezê te ji nefsa canê xwe re bim, ez bi xwe bikir bim.

De lê lê weylê êê Xezalê.
De lê lê weylê êê lê mîre jê.

* Bêje lolooo.....

Xezalê bankirî: Peyawo çûyî karwaniyo çemê Palwê bişewitê çemekî bi biye, evan biya ser bejan min û te da girtiba siye, ez zanim kolozê te çiye, ez nizanim gotin û galûgalê te ji bo çiye?.

Ezê rabim li karwanê mala babê xwe bikim qêrîn û qutîn û gazî ye,

hezar û hefte sed çeqmaqê mosilkanî wê derkevin ji quntarên çiya ê te bikujin karwanê te bormîş bikin belê ji malbata babê min re bêçekê şerme û kêmayî ye,

De lo lo wey lo lo peyawo
De lo lo wey lo lo karwaniyo

Mihê gazî kirê:

Bêje lê wey lê êê lê wey lêê wey lê lê wey lê

Xezalê mîrmezê çemê palwê bişewitê çemeka ber bi riye,

teter û başivon û bazirgan pêda diçin û pêda tênê û ez nizanim tu keça çeqalekî, ne tu keça beqalekî ne tu keça helawfiroşî , ez nizanim esl û feslê te ji kî derê ye.

De lê lê wey lê êêê lê Xezalê
De lê lê wey lê êêê mîrmezê.

* Bêje lo wey loo lo wey lo wey lo wey lo wey lo

Xezalê bankir: peyawo deve çû, karwan çû

serê min bi dora serê te geryawo

çemê palwê bişewitê çemeka bi riye teter û başvon û bazirgan pêda diçin û pêda tê ye,

xwazî ji xêra xwedê ra min zanîba esil û feslê te teyê ji kê deriyê ye.

De lo lo wey lo lo peyawo
De lo lo wey lo lo karwaniyo

* Mihê bêje lê; Lê wey lê lê wey lê ê lê wey lê

Xezalê mêrmezê her deme xweş her deme vî feratî leme leme

kew şêrînê tîne berê çeme

mêkew vêra xwe da bû rex çeme

hege tu pirs û suala esil û feslê min kê

ez Mihê Şemdîn im, ez delalê hezar heft sed malê êzdiya me, ez bi xwe me

De lê lê wey lê êê lê Xezalê
De lê lê wey lêêê lê mîrmezê

* Bêje lo wey looo lo wey loo lo wey lo wey lo wey lo

Peyawo deve çû, karwan çûyo ser min bi dora serê te geryawo

çemê palwê bişewite çemeka bi kendale, van kendala bi serî min te da nale nale,

peywo hege tu pirs û suala esil û feslê min dikî, ez Xezala keça mîrê palwê me bi keçkanî navê zilxik bû ji rûmeta bab û dayka min navê min kirine têlî zelîxan babê min hukim dikir li hezar û heft sed mala

De lo lo wey lo lo wey lo lo peyawo
De lo lo wey lo lo lo karwaniyo

* Bêje lê wey lêêê lê wey lê wey lêê wey lê lê wey lê

Mihê bankirê Xezalê mîrmezê çemê Palwê bişewite çemeka bacane va bacana ser bejna min û te şax vedane feşîrek şerqiya bi me reyê dibêjê çavê şîn sipî nabe

kurkê êzdiye keç misliman e
de lê lê wey lê êê lê xezalê
de lê lê wey lê êê lê mîrmezê.

* Xezalê ban kir

Lo wey lo lo wey lo lo wey lo wey lo wey lo...

Çemê Palwê bişewite çemeke bi kaşe

ku ne ev reh leve du dest rehlî min dî li halin,

heft salê temam babê min li yek wek te digeriya, hege tu çû li ser cila babê min rûnişta wî min etayî te bike belaş

De lo lo wey lo lo peyawo
de lo lo wey lo lo karwaniyo

* Mihê ban kir lê wey lêêê lê wey lê wey lêêê wey lê...

Xezalê mîrmezê çemê Palwê bişewite çemek ber ye

serê quranê elf û bêye min ku belkê aqlê te civite qeyînetare lewkekî cemala nikare

hilîne ji erdê, min nizanî aqlê te ke reng firî biharîye ke befre li ber pêye, ku ez ne Mihê Şemdîn im û ez xulamê Mihê Şemdîn im tu dezyekî ji dewa ebayê Mihê bigrê heft pîne

Wê vêkra bikivin erdê ye,
de lê lê wey lêêê lê Xezalê
de lê lê wey lêê lê mîrmezê.

*** Ev serhatî û stiran ji devê stiranbêjê bi nav û dengê çiyayê Şingalê Feqîr Xidir wergirtiye û çawa gotiye min wesa li qelem daye.**